# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (202):

## Gundê "Zêtûnakê" - desteserkirina li ser malmewalan û dizîna kevneşopan, nûkirina girtinan li Şiyê, geregoşiya hilgirtina çekan, duretî û hin dijayetî


















Binpêkirin di dermafê xelkê Bajaroka Şiyê û hin gundên pêve girêdayî de (yên di bin desteseriya Milîseyên "Firqit Silêman Şah" û serkêşê wê "Mihemed El' casêm - Ebû Emşe" de) berdewam dibin û têne nûkirin, piştî ku "Ebû Emşe" berevajî biryara surginkirina wî ya ku ji aliyê "Komîta Rewayî" ve derketî, bi parastina Istîxbaratên Turkiyê li ciyê xwe ma; Û di navboriya çend heyvan de, bidehan ji hemwelatiyên wir li ser destên "El'emşat" rastî revandinê hatin, vêrgiyên diravî yên mezin li ser hatin ferzkirin ji bo berdanê, yan jî girtinên bêsûcane ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û "Asayêşa Leşkerî" ve (ya ku li bajarokê piştî biryara dûrxistinê hatiye damezrandin), digel hepiskirin û ferzkirina baceyên diravî û ta ku berê hatibin girtin jî, bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re yan di bin navnîşana "rastkirina rewşên" ên vegerîne de, û vêre jî rûmetkêmkirin, îşkencekirin û gefkirina qurbaniyan û merivên wan ji bo serpêhatiyên xwe hewal nedin, ta radeya ku pir bi çetinî em agahiyan werdigrin, ji ber ku qurbanî razî nabin têkildariyê bi derve re bikin û nejî dixwazin binpêkirinên wan werin belavkirin, da ku rastî cezayên mekintir neyên, û bi taybetî jî piştî ku lêkolîn û seredanên "Komîta Vegerandina Mafan a Hevbeş" encamine bervajî bi ser xelkê de anîn.

**Ev binpêkirin û tewanine têvel in:**

**= G ."Zêtûnakê":**

Bi Navça "Şera" ve girêdayî ye, /18/K.M ji navenda wê dûr e, ji dora /70/ malî pêkhatî ye, dora /500/ nişte ji nişteciyên Kurd ên resen tê de bûn, di dema dijberiya bi ser herêmê de tev penaber bûn, jê dora /35malbat=125nişte/ vegerîn, ên din zorane koçber bûn, û dora/30malbat=175nişte/ ji anîndeyan tê de û dora/35malbat=200nişte/ji anîndeyên perwedkarên pêz di çadirên ku li nav Kela "Nebî Horî" (ya hevcîwar) hatine venandin de, hatin niştecîkirin.

Û di encama topebarandina gund de li dema şer, mala Hemwelatî"Xelîl Ehmed Horo" hate roxandin, bi piçekî ziyan gihîşte hejmarek mal, û bêtirî deh miyan û du çêlan hatin kuştin; Û li 4.2.2022an.Z temenmezin "**Ehmed Mihemed Horo** /77/ sal" şehîd bû.

Milîseyên "Artêşa El'nuxbe - Ceyş El'nuxbe" (ya ku "Mu'itez Erselan" serkêşiya wê dike) gund desteser dikin, Mala "Fayêq Hec Ehmed Zade" ji xwe re kirine biryargeheke leşkerî, û piştî ku ketin gund beşek ji kelûpelên malên ên vegerîne dizîn û tevaya tiştmiştên dora /35/ malên ku dest danîne ser jî talan kirin tevî hilkirina derî û pencereyên hinan, jê xwarinvexwarin, firaxên baqirî, cerên gazê, alav û amûrên elektirîkê û amûrên taqeta elektirîka roniyê û hin tiştên din; Û herweha jî dizîna tirektora çandiniyê û makîna pîkab ên "Şêxo Fayêq", tirektora"Beşîr Qere Mihemed", sûzûkiya"Reşîd Horo", tirektorek (e ku xwediyê wê piştî dandina vêrgiyeke diravî ew vegerandî), giropa zayenda elektirîkê (ampêran)ya "Hecî Menan Fayêq Zade", dora /10/ matorên dutekerî, dora /20/ giropên zayenda elektirîkê yên taybet bi malan û bîrên kûr ên avê, kelûpelên hundir herdu mizgeftên gund û kelê (yên ku paşê careke din hatine amedekirin), tevaya acetên guvêşgeha zeytûna ya "Menan Fayêq Zade" (ya ku avahiya wê kirine axurê pêz), guheztok (tirans) û keblên toreya elektirîkê ya giştî, jimarokên ava vexwarinê ji malan tevî lûleyên toreya wê, heyînên herdu stasyûnên hilkişandina ava vexwarinê(yên ku avahiyên wan roxandine) û tevî lûleyên sereke yên ku berî dagîrkeriyê av digîhandin /16/ gundan.

Herweha wan dest danîn ser dora /6/ hezar darên zeytûnê tevî hin rezên tirî, hin jê yên malbatên "Qirmiz, Mûse, Qere Mihemed, Husîk, Şaşik, Henan Îbo, Fayêq Hec Ehmed Zade, Zekeriye Xelîl, Silêman Xelîl, Ismayîl Şêxo" ne (yên ne li wir), weha jî ser masîgeheke mezin e "Menan Fayêq Zade", û bi ser de jî ew 50% li ser berhema werzên (mûsim) malbatên ne li gund û 10% li ser ên li wir ferz dikin; Li gel wê jî çêrandina bêwijdan ji keriyên pêz re di nav zeviyên zeytûna û erdên çandiniyê de.

Û wan bi rengekî fere Cîgeha "Kaniyê" ya Rojhilatê kelê (ya geştiyarî ya gelêrî) kolan û piraniya daran tê de qut kirin, da ku hewzoyeke perwerdekirina masiyan çêbikin, li gel wê jî ji bo lêgerîna li kevneşopan û dizîna wan, lê bê dawîkirin ji pirojeyê re; Û bi taybetî herdu serkêşên "Artêşa El'nuxbe" - "Mu'itez Erselan û Ehmed El'cum'e" , li ber çavên Istîxbaratên Turkiyê tevaya cîgeha Kela"Nebî Horî" û zaretgeha gorgeha serdirêjokî (heremî) ya Romanî, ji bo lêgerîna li kevneşop û kinzên veşartî kolan û rêş kirin - di raporên berê de me çêrê kiribû; Û jêdereke xwecihî tekez kir ku kûrbûna kolandinê gihîşte/2-3/mitran, û kolandin bû sedema hilkirina dora hezar darên zeytûnê û roxandina dora/20/hiktar erdên çandiyê yên xelkê gund.

Û xelkê gund ên mane jî rastî curbecur binpêkirinan hatin, mîna revandin û girtinên vêsûcane, işkencekirin, rûmetkêmkirin û peresitandin û yên din.

Divê were bîranîn ku serkêşekî "Artêşa El'nuxbe" yî bi navê "Ebid El'kerîm Yûnês" Tûnisî ye û berê jî Da'işî bû, û piştî herdu hevjînên xwe yên berê berdan, bi keçeke gund re zewicî û vêlak ji bo rûniştinê ji xwe re di gund de ava kir.

**= Revandin û girtinine nesûcane:**

**-** Li 26.5.2022an.Z, Hemwelatî "Mihemed Hemîd Hemo /55/ sal" ji xelkê Gundê "Kurzêlê" - Şêrewa, ji aliyê giropeke çekdar e nenas ve hate girtin, û ta niha çarenûsa wî nediyar e.

Û Destlatên Dagîrkeriyê ev girtin:

**-** Li 8.3.2022an.Z, Hemwelatî "Ebid El'rehman Gul Ehmed /33/ sal" ji xelkê Gundê "Bablîtê" (yê ku li Bajarê Efrînê berberî dikir), bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re, û piştî ferzkirina cezayeke diravî li ser, li 8.6.2022an.Z hate berdan.

**-** Li 31.5.2022an.Z, hemwelatî "Hesen Hac Henan kurê Mihemed /30/ sal, Ferîd Ebid El'qadêr kurê Şemis El'dîn /33/ sal, Umer Tatoz kurê Mihemed /32/ sal" ji xelkê Gundê "Keferdelê Jêrin", bi tuhmeta têkeliyê bi R.X a berê re, û bo B.Cindirêsê hatin birin; Divê bête zanîn ku berê jî ew hatibûn girtin, û ji heman gundî lîstak bi girtina hin din jî heye.

**-** Ji deh rojan ve, Hemwelatî "Dilo Adêl Erebo /30/ sal" ji xelkê Bajaroka "Celemê" - Navça Cindirêsê, bi tuhmeta têkeliyê bi R.X a berê re, û ta niha vêsûcane bendkirî ye.

- Li 3.6.2022an.Z, Hemwelatî "Nisrîn Mihemed Weqas /30/ sal" ji xelkê Bajaroka"Kaxrê" - Navça Mabeta, da ku dema cezaya hepsa xwe ya neheq û mayî (ya ku bi tuhmeta têkeliyê bi R.X a berê re li ser hatiye sezandin) bi dawî bike, piştî berdana wê di demeke berê de bi lixwegirtineke diravî li dû girtina wê li 30.12.2021an.Z; Divê were zanîn ku ew careke berê jî li 21.9.2021an.Z hatibû girtin û piştî demekê hatibû berdan.

- Li 7.6.2022an.Z, herdu hemwelatî"Emîn Menan Menan /53/ sal" ji xelkê Gundê Gemrûkê (yê ku berê jî carekê hatibû girtin) û "Mes'ûd Samî Me'imo /37/ sal" ji xelkê Gundê "Şorbe" ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Sivîlî li Mabeta" ve, bi behaneya ku wan bi makînên xwe yên mîkrobas, di dema R.X a berê de xwepêşandêr diguhestin, û piştî ferzkirina baceyên diravî li ser wan, li roja din hatin berdan.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

- Li 25.5.2022an. Z, endamekî ji ewlehiyeta Kompaniya Elektirîkê, di kargeha wê de bi çeka xwe lîst, û di encamê qurşînek jê derket û li karkirê kargehê Hemwelatî "**Hîkmet Menan Mihemed** /32/ sal - ji xelkê Gundê Mezin" ket û bi kûranî birîndar kir, û bi ser de ji bo dermankirinê ew birin nexweşxaneyeke Bajarê "Entekê" yê Turkî, û ji nû ve vegerandin Nexweşxana "Ibin Sîne" li Bajarê Efrînê, bê ku tu piroseyên neştegêriyê li wir jê re were kirin; Û kiryar jî revî ye, û tu pêngavên zagonî ji aliyê destlatên xwechî de nehatine avêtin, û xwediyên birîndêr jî tu gilî pêşkêş nekirine.

- Li 5.6.2022an Z, li nêzîk çateriya Gundê "Enderiyê" li ser riya giştî ya Efrîn - Cindirêsê, di nav giropeke ji Milîseyên "Firqit El'hemzat" û du çekdarên ji Êla "El'mewalî" yên li Gundê "Tilifê"rûniştine de pevçûnin derketin, piştî ku giropê hewilda ku herdiwan bigre, piştî ku Hemwelatî "Şukrî Ken'an" gilîk li wan vekir, ji ber ku herdiwan bi behaneya ku ew erdê hemwelatiyekî ne li gund bi rêve dibe, gefûgur dabûnê û vêrgiyeke diravî mezin jê xwestibûn; Û di encama wan pevçûnina de çekdarek mekin birîndar bû û niha li nexweşxaneyeke Efrînê tê dermankirin, yekî din jî hate girtin, û çekdarên"El'mewalî" li dor herdu gundan ketin amedebaşiyê.

- Piştî xirecirî û tevliheviya rewşan li Bajarê Cindirêsê, li dû derketina xwepêşandanan li şeva 3.6.2022an.Z, li dijî Kompaniya Elektirîkê û şewtandina biryargeha wê; Li şeva 5.6.2022an.Z, Odeya "Waliyê Turkiyê" li Biryargeha Encûmena Xwecihî - Şarederiya Gel a berê, bi mûşeyeke Arbêcê "A R B C" -di demeke karmend tê de tunebûn- hate armanckirin, û di encamê de tenê ziyanin şênberî çêbûn.

- Li 7.6.2022an.Z, bombeyeke teqîner bi makînak pîkab de, li Taxa Mehmûdiyê - B.Efrînê - li rex Dibistana Pêşesaziyê hate teqandin, û di encamê de kesek birîndar bû û ziyanin şênberî çêbûn - li gor "Berevaniya Sivîlî li Efrînê".

**= Binpêkirinine din:**

- Li 27.5.2022an.Z, endamên rêbenda çekdar a Milîseyên "Tîpa 21- El'firqe21" a li orta B.Cindirêsê - Kolana/16/ şerê xwe di Hemwelatiyê Kurd"Sibhî Kekeman", hevjîn, sê kur û du bûkên wî dan û kotek û kêmrûmet kirin, ji ber ku lawê wî yê ciwan "Mihemed" ji rêbendê daxwaza vekirina rêkê kir, da ku matora xwe ya duloqî derbasî mala wan a hevcîwar bike; Bi ser de jî gefgurên qewtandinê dan malbatê, û malbatê jî nikanî û newêrî tu giliyan pêşkêşî tu aliyan bike.

Û di heman dîrokê de, li taxa jêrin a bajêr, giropeke ji anîndeyên "Encara" - Rojavayê Heleb li xortekî negîhayî - kurê "Ferîd Huseyn"- xistin, piştî ku zaroyên wî ji wan xwestin ku pezên xwe ji nav zeviyê zeytûna (yê bavê wî yê û li Başûrê bajarokê) derînin.

- Li 2.6.2022an. Z, piştî ku Hemwelatî "Xelîl Mistefa Tobal/45/sal" ji xelkê Bajaroka "Celemê" - N.Cindirêsê li ser çerandina anînedeyên Êla "El'mewalî" ji pezên xwe re di nav zeviyeke wî ye bermayên çinîna colbana de nerazîbûna xwe da xuyakirin, wan mekin lêxistin û gotinên kêm jê re kirin. Û paşê li gund di nav "Tobal û herdu birayên wî" û wan anîndeyan de careke din pevçûnek çêbû, di encamê de hin birîndar bûn, û Milîseyên "Feyleq El'şam" û serkêşê wan li gund "Urwe Siwêd" destêwerdan kirin, ta ku li roja din "lihevhatinek di nav herdu aliyan de" ji aliyê "Şêx û rawekaran" ve hate ragîhandin - perçevîdiyok heye, tê de ferzkirina /4/ hezar dolar li ser " Xelîl Tobal" hatibû ferzkirin û gerek di navboriya deh rojan de were dandin, bi behaneya ku destê jineke ji Êla "Mewaliya" hatiye şikandin; Û weha yê ku dijberiya wî hatiye kirin

û ziyan dîtiye ( yê ji nişteciyên gund ên resen) bû "tewankar", û bêmaf(bêheq) bi tibabeke diravî ye mezin hate cezakirin.

**-** Li 6.6.2022an. Z, di encama topebarankirina Hêzên Turkiyê û milîseyên wê de ji Gundê "Bênê" re - Şêrewa (yê ku di bin desteseriya Artêşa Sûriyê de), destê Hemwelatî "Nidret Zekeriye Elî /21/ sal" (ya ji koçberên G."Endarê")) bi perçeyên avêjtokekê birîn bû, û ziyanin şênberî gihîştin herdu malên "Ebdo Hemadê" û "Ebid El'selam Ehmed".

**-** Li 6.6.2022an. Z, du mêran ji anîndeyên ku di çadirgeheke "Reco" de rûniştine şerê xwe di xort "Osman Elî Hemkê /22/ sal" (yê ji xelkê Gundê "Etmana" û firoşkarê sûtemeniyê li Bajaroka"Reco") dan, kotek kirin û bi kêran lêxistin, piştî ku ew razî nebû ku bi perên rizî bifroşe wan.

**-** Li 9.6.2022an.Z, agirin bi cîgeheke îhracê (ye nêzîk Gundê "Be'irava/Elîbaza" - Navça Şera (ye ku berê piraniya darên hatibûn qutkirin) hatin xistin, û "Berevaniya Sivîlî li Efrînê" tekez kir ku tîpên(tîmên)wê agir vemirandin.

Bûyerên pozquretî û dijberîkirinên rojane û rengereng li dijî xelkê resen û malmewalên wan, ji aliyê endamên milîseyan û gelek anîndeyên ku xwe bi wan mekin dikin ve nayêne jimartin, di siya geregoşiya hilgirtina çekan, belavbûna milîseyan û hevrikiya wan li ser tiştên dizînê û çarçewa bandoriyê de û li ber çavên Istîxbaratên Turkiyê; Û pir kêm jê têne belavkirin.

12.06.2022an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Pakrewan "Ehmed Mihemed Horo".
- Kolandin û rêşkirina cîgeha Kela "Nebî Horî", Navenda Kevneşopa Idlibê/ya Rikber, 13.7.2018an.Z.
- Zaretgeh û Mizgefta Nebî Horî berî û piştî dagîrkeriyê.
- Hemwelatî "Hîkmet Menan Mihemed".
- Teqîna pîkabekê li Taxa Mehmûdiyê li Bajarê Efrînê,7.6.2022an.Z.
- Şewatek li cîgeheke îhracê, l i nêzîk Gundê "Be'irava/Elî Baza" - Navça Şera - li gor Berevaniy Sivîl li Efrînê, 9.6.2022an.Z.